

*Bi zimanê din jî heye, wekî minak:  
Erebî, Derî(Farsî), Înglîsî, Fransî, Almanî,  
Tigrînya, Tirkî.*

**Kurdî**

# Maf û Berpirsariyên bingehîn ya gelek Girîng li Almaniya

– Bi zimanê zelaî û hêsa hatiye nivîsandin û şîrove kirin –

## Bingeha Hemwarî, bihevre jiyîn bi Aşîtî û Ewlehî



**bürgerstiftung**   
**lebensraum  
aachen**

Nivîsara Yasayên Bigehîn	Maf	Berpirsyarî
1	„Weqara mirov pîroze.“ Min maf heye ku her mirovek - û Dewlet – rûmeta weqara min bigre û xwedî bike.	Ji ber vê yekê, ez divê rûmet û qedrê mirovên din bigrim – Jin, Mêr, Zarok – ji ber ku ew jî mirovin.
2 Liqa 1	Min maf heye bi azadî û serbestî pêşketin xwe re çêkim. Kesên din ev maf nine ku ev mafê min binpêbikin.	Ez jî divê qebûl bikim ku kesên din jî maf hene bi serbestî pêşketin xwe re çêkin û ez nikarim ev mafê kesên din binpêbikim.
2 Liqa 2	Min maf heye ku bijîm. Min maf heye bi cismek ewleh û bê zêdegawî bijîm.	Ez divê qebûl bikim ku kesên din jî mîna min mafê jiyana hene. Ez nikarim zêdegawî hember tu kes bikim – Jin, Mêr û Zarokan.
3 Liqa 1 û 2	„Hemû mirov li ber qanûnan wekhev in.“ „Jin û mêr li ber qanûnan wekhev in.“ Yanî: Em hemî wekhev in, jin an mêr. Hemû mafê diyarkirina jiyana xwe heye..	Ez dive hirmeta jin û mêran mîna hev bigrim – bê hesebandina emir an navdarî. Tukes nabe mîna xwedanî an serwet bê hesebandin.
3 Liqa 3	Ez nabe bibim amanca ziyan an bextiyarbûn ji ber • Cinsa min, • resena min, • nijada min, • zimana min, • ax û welatê min, • ol a min, • nêrîna olî û sîyasî ya min an • kêmasî ya min.	Tukes nabe amanca ziyan an bextiyarbûn ji aliyê min re ji ber • cinsa wî, • resena wî, • nijada wî, • zimana wî, • ax û welatê wî, • ol a wî, • nêrîna olî û sîyasî ya wî an • kêmasî ya wî.
4	Bawerîya min dikare her tişt bibe ku ez dixwazim.	Ez nikarim tukes re zor bikim ku bawerî bi olek bîne. Ez qebûl dikim ku kesên din, baweriyên xwe hene.
5	Ez dikarim nêrîna xwe bi azadî bînim ziman.	Ez qubûl dikim ku kesên din jî nêrîna xwe bi azadî bînin ziman. Nêrîna cor bi cor şerta bingehîn ji bo demokrasiya zîndî ye. Ev tişt jî ez hemwarî dikim.
6 Liqa 1 û 2	Ez dikarim zarokên xwe wesa mezin bikim ku ez dixwazim lê li çarçeva yasayên Almaniya.	Ez dikarim zarokên xwe xwedî bikim û mezin bikim li gor çarçeva bigehîn ya yasayî. Ez zarokan lê nadim.

Nivîsara Yasayên Bigehîn	Maf	Berpirsyarî
7	<p>Hemû zarokên ku li Almaniya dimînin maf hene ku biçin dibistanê. Dewlet maf heye û berpirsyarî heye ku berê xwe bide mamosteyan, da ku zarokan wisa perwerde bikin ku ji bo yasayên bingehîna demokrasî ya welatê me hîmet hebe û ev yasa xwedan bikin.</p> <p>Ji ber vê yekê, mamosteyên biyanî re tê daxwazî kirin ku bi zimanê Almanî bipeyvin û ev yasa jî xwedan bikin.</p>	<p>Wekî Dê an Bav, az berpirsyarim ku hoş zarokên xwe re hebe ku bi rêkûpêkî biçin dibistanê û wacibî yê dibistanê bicîh bînin. (Ji ber ku dibistan pêwîste, pere ji bo dibistan ne hewceye.)</p>
8	<p>Ez dikarim bi aştî û bê sîleh bi kesên din re têkilî hebe.</p>	<p>Ez nikarim sîleh hebe.</p>
10	<p>Tenê ez dikarim nameyên xwe vekim. Dewlet jî nikare nameyên min veke.</p>	<p>Ez nikarim nameyên kesên din vekim.</p>
13	<p>Tukes nikare bê hundir mala min, eger ez nexwazim. Ji bo tiştên derveyî, divê hakim ferman bişîne.</p>	<p>Ez nikarim biçim xanî ya kes, eger xwedan xanî nexwaze.</p>
14	<p>Mal û hûr-mûrê min ji aliyê dewlet tê parastin (wekî mînak: bi rêya yasayên sizadan, polîs, dadgeh).</p>	<p>Min berpirsyarî heye ku ji mal û milkên kesên din/an ya dewlet (wekî mînak, sazîyên giştî û parkên giştî) xwedî derkevim û tu ziyar wan re çê nekim.</p>
16a	<p>Eger ez ji devera şerê re hatim Almaniya an ji ber ol a min, nijada min an nêrîna sîyasîya hatim revînê, li Almaniya min maf heye ku Penaberî bistînim.</p> <p>Ev pêvajoyeka gelek girînge ku ji aliyê birêveberên alînegir tê bicîhanîn.</p> <p>Eger ez bi biryarên wan ne qayil bim, ez dikarim gilî xwe li dadgeh bidim gazin kirin.</p>	<p>Min berpirsyarî heye ku li vê pêvajoyê de arîkarî bikim, agehî yê dirust bidim pêşkêşkirin û belge û nasnameyên heyî bidim daxuyandin (wekî mînak, ji welatê xwe re).</p> <p>Min mafê penaberî tune, eger ez ji ber birçî bûnê bêm revînê û bixwazim ku sefê telîmê li Amaniya bixwînim. Di rewşekî wisa de, ez divê li gor qanûnên koçberîyê daxwaziya mayîn li Almaniya bikim.</p>
17	<p>Ez dikarim bitenê an bi kesên din re, rêxistinên hikûmetî re gazin bikim an daxwazîyekî ji wan re bişînim.</p>	
19	<p>Dewlet ev mafên bingehîna ya me dide pêşkêş kirin ku belkî ji ber yasayên hewceyî bîn bisînor kirin.</p> <p>Eger ev mafên min bîn bînpêkirin, li dadgehê dikarim bidim gazin kirin.</p>	
20a	<p>Min maf heye bihna xwe bi hewayê paqij taze kim, avên paqij vexom û xwarinên selametê heywanî û giyayî hebe, yanî, bê jêmayîyên rîx, tiştên jarî û dermanan.</p>	<p>Berpirsyariya mine ku çavkaniyên siriştî mîna hewa, av û erdê bi awayekî qenc, dilovan û aborî bikar bînim. Berî ku ez tiştêkî bavêjim, ez divê mêze bikim heke ev tişt dikare bê çêkirin an disa tê bikar hatin.</p>

# Bi vî rengî dewleta me, Komara Federala Almaniya, dixebitê

Ev mafê bingehîn tenê ji bo welatî ninin. Ev maf di navber welatîyan û dewlet jî heye. (Liqa 1). Ji ber vê yekê, garantîya nivîsara liqa 19 gelek girînge. Herwisa girîng ewe ku „Komara Federala Almaniya welatekî civakîya xwedan demokrasîye.“ (Liqa 20 Beşa 1 GG)

Veqetandina desthilat, parkirina desthilat di navbera rêxistinên cor bi corê hikûmetî de ye, ku **hevdu kontrol dikin**. Armanç ewe ku, desthilata rêxistinên cor bi cor û kesên cor bi cor bên bisînor kirin û bi vî awayî zêdegavî di desthilat bê rawestandî. Veqetandina desthilat, yasayek girînge di demokrasîyê îro de.

Li gor mînakêkî dîrokî sê cor desthilat tên neqîşandin:

## Desthilata Parleman (Parlemanî):

Ev rêxistin û sazîyên hikûmetî tê tevlêkirin ku ji bo qanûnan berpirsyarî hene. Li Almaniya, ev Parlemana Federal û Civata Federalin – lê belê herwisa parleman û hikûmeta Deverî jî lê bi awayekî sînordar.

## Desthilata Gerinendan (Fermanberan):


Ew ji bo bicîh anîna qanûnan berpirsyarin. Wekî mînak, wezaretên cor bi cor, rêxistin û sazîyên hikûmet û polîs. Li Almaniya, Hikûmeta Federal sazî û rexistinên cor bi corên herî baş çê dîke.

## Dadgeh (Dadmendî):

Ev **li hemî Dadgeh**an tê çêbûne û parleman û fermanberan raçavdîke. Dadgehyan biryar distînin li ser gazînda welatîyan li hember birêveberîyê (wekî mînak: sizayên trafikê an qebûl nekirina daxwaznama penaberîyê), lê belê herwisa li ser qanûnên nû. Hakîman **serxwebûne û tenê li hember qanûn berpirsyarî hene**, yanî, tukes nikare wan re bêje çawan biryar bistînin.

Pervekirina desthilat digel qanûnên bingehîna dewleta me bi hev re ne – yanî bihev re jiyînê me di Azadî, Aştî û Ewlehî de tê qarantî kirin.

Herwisa yanî: **Tenê Hikûmet desthilat heye, ev jî bitenê di çarçeva qanûnên bibandûr** (herwisa, edaleta şexsî tune, xwîndarî tune, kûştin li ser şeref û xîret tune û htd.).



Modified from source: www.gutefrage.net



**Nivîskar:**  
Dr. iur. Frohlinde Weber  
Inge Loisch  
Leon Pohl  
Norbert Greuel

**Weşanger:**  
**Bürgerstiftung Lebensraum Aachen**  
V.i.S.d.P.:  
Hans-Joachim Geupel, Gerîmendêr berpirsyar jî bo wegerandin bi Kurdî: Lingua-World GmbH

Sparda Bank West eG  
IBAN: DE46 3706 0590 0003 6900 91  
BIC: GENODED1SPK